## Em ê budceya ciwanan çêbikin

Em ê mafê xebitîna ciwanan misoger bikin û çareseriyên istihdamê pêş bixin.

Li dijî bêkariya ciwanan û xizaniya ciwanan em ê têbikoşin û ji bo ciwanên bêkar em ê dahata asgarî bixin rojevê.

Ji bo ku ciwan ji mafê tenduristiyê bêheq sûd wergirin em ê xebatan bikin.

## Em ê plana ewlehiyê ava bikin

Ji bo jinên ciwan ku li gund dijîn, yên ku wek karkerên malan ked didin, yên ku di çandinê de wek karkerên bêheq dixebitin, ji bo ciwanên ku nîvwext, demsalî, demborî yan jî ji bo staj û hînbûna pîşeyan dixebitin em ê plana ewlehiyê ava bikin ku sîgortaya wan a tenduristiyê, ya teqawidbûna civakî û ya bêkariyê bê dayîn.

Ji bo ku em pêşîyê li tiryakê bigirin em ê xebatên hişmendiyê bi piştgiriya civakî xurt bikin. Ji bo ku bêheq alîkariya ciwanên tiryak bikin em ê navendên şêwrê û rehabîlîtasyonê vekin.

Em ê zagona mecbûrî ya leşkeriyê betal bikin ku li ber mafê civakî û jiyanî yê ciwanan asteng e. Em ê statuya zagonî bidin mafê redkirina wijdanî.



YEŞİL SOL PARTİ

MECLISA CIWANAN

DÎSA CIWAN
DÎSA SERKEFTIN

www.yesilsolparti.org

YEŞİL SOL PARTİ

MECLISA CIWANAN

DÎSA CIWAN
DÎSA SERKEFTIN



www.yesilsolparti.org

# BI CIWANÊN AZAD RE BER BI KOMARA DEMOKRATÎK VE

## *Em bi ciwanan re ber bi Komara Demokratîk ve dimeşin!*

Em tên ji bo ku ciwantî azad bibe, tu kes mudaxilê şêwazên jiyanê yên ciwanan nebe û ciwan bi awayekî wekhev beşdarî pêvajoyên biryardayînê bibin.

Li dijî serdestiyê, zext û zordariyê, mêtîngeriyê û cihêkariya ji ber temenî em ê Rêya 3'yemîn a îro û siberojê bi ciwanan re ava bikin.

**DÎSA CIWAN DÎSA SERKEFTIN**

Li dijî pergala ku jiyana ciwanan dorpêç dike, ciwanan xizan dike û dahatûya wan ji destê wan distîne em hene û em tên ji bo ku ciwan di rêveberiyê de û di hemû pêvajoyên biryardayînê de cih bigirin!

Li dijî zext û zordariyê, li dijî mêtîngeriyê û cihêkariya ji ber temenî em bi hêza ciwanan amade ne ku Rêya 3'yemîn a îro û siberojê ava bikin!

***Em ê pergala azmûnên nehêja û neadil*** biguherînin ku keda bi mîlyonan xwendekaran û malbatên wan tune dihesibîne! Ji bo ku xwendekar li gor behre, fahm, afrînerî û hunerên xwe jiyana xwe ya perwerdeyê saz bikin em ê guhertinan bikin.

## *Em ê feraseta zihniyeta perwerdeya yekperest têk bibin*

***Em ê feraseta ku zihniyeta yekperest li ser me ferz dike*** û pergala jiberker biguherînin û em ê feraseta perwerdeyê ku ji cihêrengiyan re vekirî ye, ya ku nirxên aştiyane derdixe pêş bigirin ber çavan û em ê pêk bînin ku di vê pergalê de têkiliya hiyerarşîk ya di navbera xwendekar û mamosteyan de bê vepirsîn, pêdiviyên hînbûnê ya xwendekaran bê berçavan, bingehên hînbûnê yên ne ezmûnî û ne şêweyî bên plankirin û bên pêkanîn.

## *Em ê perwerdeya zanistî, azad û bi zimanê dayikê pêk bînin*

Em ê bingeha azad û demokratîk ya zanîngehan, xweseriya îdarî ya perwerde û hînkirinê bi hevgirtina ***"fikra azad-perwerdeya akademîk a zanistî-mirov û xweza pêk bînin.***

Em ê ***Meclisên Demokratîk yên Zanîngehan*** ava bikin ku di modela zanîngehên demokratîk, azad û beşdar de hemû pêkhateyên zanîngehê xwedî mafê wekhev ê gotin û biryarê ne.

Em ê di her asta perwerdeyê de li dijî "saxlemî"yê têbikoşin. Em ê wê ferasetê bingeh bigirin ku li gor pêdiviyên astengdaran xebatan dike, bi xwezayê re hevseng e û em ê ***dibistanên bêasteng û kampusên perwerdeyê ava bikin.***

Em ê ji bo zanîngehên demokratîk û feraseta li ser azadîxwaziya jinan ***"seferberiya mor"*** bidin destpêkirin.

Em ê li dijî feraseta zayendperest û yekperest zanîngehên ku em tê de rastî cihêkariyê nabin ava bikin.

Em ê di kampusên zanîngehan de ***"Yekeyên Pêşîgirtina Êriş û Tundiya Zayendî"*** ava bikin.

Em ê ***"Helwestnameya Zayendiya Civakî"*** ya ku YOK'ê betal kir, ji nû ve bixebitînin.

Ji bo ku polîtîkayên ciwanan rasterast ji hêla ciwanan ve bên diyarkirin û bên birêvebirin em ê Wezareta Ciwanan ava bikin.

***Em ê wargehên bêpere ava bikin*** ku pêdiviyên xwendekaran yên hêwirîn û xweyîbûnê temîn dikin.